

Fîlma av û hewayê > Sazana av û

hewayê li Afrîqaya Başûr

Guherîna av û hewayê dê ser gel, civakê û eko-sîstemê li dinyayê bandorê dayîne. Deverên ku jêrtir in, deverên giravan, cemser, deverên hişkesalî li Afrîqayê herî zêde dikevin ber bandora vê yekê. Li van deveran, zêdetir ew kesên herî hejar in ku pirtir zîyanê dibînin. Şaredariya eThekwini`yê li Afrîqaya Başûr projeyeka giştalî ya sazana/adapteya av û hewayê pêk aniya ku hevdem asta standard/pîvana jiyana gel jî zêde dike. Ev tenê mînakek ji gellek mînakên sazana pêkhatî li cîhanê ye ku em dikarin gellek tiştan jê hîn bibin.

Beriya ku hûn fîlmê bibînin, karên ku hûn gerek bikin ev in:

1. Li gorî we guherînên av û hewayê çawan dikarin ser deverên hişkesalî li Afrîqayê bandorê dayîne?
2. Çima hûn fikir dikin ku kesên hejar ji kesên dewlemend pirtir dikevin ber zîyanên guherîna av û hewayê?

Erk û karên têkildarî fîlmê:


1. Bibêjin çima Şaredariya e-Thekwini`yê li Afrîqaya Başûr li devrekê ye ku bi awayekî taybet ber (zîyanên) av û hewayê ye?
2. Kurteyekê amade bikin ji karên ku Şaredariya eThekwini`yê kirine sa ku civak ewle bibe bi awayekî baştir bikeve ber guherînên av û hewayê?
3. Zanist û aborî, her du, bo jordabirina standarda jiyana gel pêwsît in. Kîjan kiryarên fîzîkî bûne sebeb ku bo gelê Buffelsdraai`yê standardên jiyana zêde bibin?
4. Çima çandina daristanên teze li Buffelsdraai`yê girîng e ?
5. Çima rakirina cûreyên giyayên biyanî li Durbanê girîng e?
6. Çima çêkirna komirên biyokî karek e ku dibe sebeba sazana av û hewayê û xurtbûna axê?
7. Başî û xala erênî ya serbanên kesk çi ne?

Erk û karên xurtbûyî:

1. Gelo hûn fikir dikin ku karên li Buffelsdraai`yê pêk tên dikarin li deverên din ên dinyayê jî pêk werin? Bersiva xwe rave bikin.
2. Rîsk û metirsiya guherînên av û hewayê li welat an navçeyekê wê demê hene ku sê hokar ser ên din serdest bin. Tehluke û metirsî: Av û hewa dê çi qasî biguhere, em ê rastî çu rûdanên tund werin? Ketina ber tehluke û metirsiyê: Qada ketina ber van metirsiyan li

dever/navçeyê çî qas e? Ziyandîtin: Gelên ku liwir dijîn dê çî qasî ji guherîna av û hewayê zîyanê bibînin?

3.



Wêne: Panela NY a av û hewayê û Dezgeha Norvêjê ya Jîngehê Metirsî/Rîskên têkildarî av û hewayê/Ziyandîtin/Ketina ber metirsiyê

- a) Bi kurtasî bibêjin li gorî we hokarên metirsî, ziyandîtin û ketina (ber tehlukeyê) çawan dikarin bo Buffelsdraai`yê li Afrîqaya Başûr, Kvam û Oslo li Norvêjê bi kar werin. Hûn dikarin cedveleka wekî ya nîşandayî li bin bersiva xwe da bi kar bînin. Eger pêdiviya we bi agahiyên pirtir li bara çawaniya ketina Kvam û Osloyê (ber vê rewşa) av û hewayê heye, li fîlma "Klimatilpassing i Noreg" ("*Sazana Av û Hewayê Li Norvêjê*") binêrin.

	Metirsî	Ketina ber	Ziyandîtin
Buffelsdraai			
Kvam in Gudbrandsdalen			
Oslo			

- b) Li gorî we cudahiya herî mezin nava Oslo û Kvamê di warê rîsk û metirsiya guherîna av û hewayê çi ye?
- c) Li gorî we cudahiya herî mezin nava Buffelsdraai`yê û Kvamê di warê rîsk û metirsiya guherîna av û hewayê çi ye?